



Rêzdar Ebdulletîf Mihemed Cemal Reşîd  
Serokê Komara Iraqê  
Ofîsa Serokatîyê  
Bexda, Iraq  
3'ê Tebaxê, 2024

## **Bo cenabê te,**

Parlamentoya Iraqê di sala 2021an de yasaya jimare 8an a rizgarbûyên Êzîdî derxist û sûcên DAIŞ'ê yê li dijî civaka Êzîdî bi taybet jî jinan weke “sûcên li dijî mirovahiyê û qirkirinê” qebûl kir. Meclisa we ji bo ronîkirina qonaxêke tarî ya dîrokê û bidestxistina mafên civakên me û ji bo heqîqetê gaveke giring û hêja avêt. Parlamentoya we bi vê qanûnê ne tenê jenosîda li dijî Êzidiyan qebûl dike, di heman demê de bi diyarkirina tedbîr û kiryarên ku Komara Iraqê ji bo kêmkirina bandorên vê wêraniya ku li ser civaka Êzîdî û mirovahiyê hatiye kirin, gava yekem a giring ji bo dadperweriyê davêje. Lê ne avêtina gavên şênber di warên wekî dîtin û darizandina sûcdaran, peydakirin û vegerandina Êzidiyên revandî, lêkolîn û tesbîtkirina gorên komî û tesbîtkirin û vegerandina terman ji malbatên wan re, nirxa vê gava destpêkê ya ber bi edaletê kêmkirî dike.

Wek ku cenabê we jî dizane, ji bo ku sûcên jenosîdê dubare nebin û ji holê ranebin, şertê yekem, navê jenosîdê ye; mercê duyem ew e ku bi beşdarbûn û razîbûna mexdûran dadwerî bê sazîkirin û rastî û serpêhatî bîrên eşkerekirin, ne di warê siyasî de, belku li gor tiştên ku wan bi xwe vegotîye. Şertê sêyem jî ew e ku ji bo civaka êrîşkar û pêkhateya wê ya civakî ji nû ve avakirina xwebawerî, rêxistinbûna hundirîn, berxwedan û hêza xwe ya afirîner ava bikin. Tê zanîn ku ji bo pêşgirtina li qirkirinan beriya ku biqewimin gava herî giring hêza berxwedana navxweyî û mekanîzmayên civakan bi xwe ye.

Di vê çarçoveyê de ku em weke Tevgera Jinên Azad (TJA) ji bo radigihînin û bang li hikûmeta Iraqê dikin ku mafên gelê Êzîdî yê civakî-çandî û etno-dînî bi awayekî destûrî misoger bikin. TJA tevgereke ji bo azadiya jinê û edaleta civakî têdikoşe. Armanca me ew e ku em mafên jinan biparêzin û di hemû beşên civakê de wekhevî û edaletê pêk bînin.

Koletî, destavêtin û kuştina jinan a ku DAIŞ'ê li ser jin û mêrên Êzîdî pêk aniye, ji sûcên herî giran ên li dijî mirovahiyê ne. Pejirandina van tawanên ji aliyê hikûmeta Iraqê ve wek jenosîd û erêkirina fermî ya vê hovîtiyê ye. Lê tevî vê naskirinê jî em dibînin ku ji bo garantîkirina ewlekarî û mafên civaka Êzîdî û pêşgirtina li êrîşên dewleta Tirk ên li ser berxwedana jiyaniyê û mekanîzmayên xwerêveberiyê û rêxistinbûna navxweyî ya gelê Şengalê, ti gavên berbiçav nehatine avêtin ku hewl didin xwe ji êrîşên nû yê qirkirinê biparêzin. Li ser wê yekê ku hîn zêdetirî çar hezar jinên Êzîdî di destê DAIŞ'ê de dîl in, li ser platformên înternetê yê kûr tînin firotin, û bi sedan zarokên Êzîdî ji nasnameya xwe bêpar in û di destê çekdarên DAIŞ'ê û malbatên wan de ne û gorên komî yê nû bi berdewamî tînin dîtin. Zehmet e ku meriv wêrankirina mezin a ku li civakeke wisa nazik hatîye xeyalkirin. Divê civaka Êzîdî di bin garantiya destûra bingehîn de bê parastin. Nebûna statuya fermî ya herêma Şengalê, nahêla ku ev civak piştgirî û parastina pêwîst werbigire.

Tevgera Jinên Azad (TJA)

<https://www.tevgerajinenazad.com/>



Birêz Serok, di 10. salvegera Komkujiya Şengalê de, em ji we hêvî dikin ku ji bo bidawîkirina vê karesata mirovî û dabînkirina jiyana ewle û bi rûmet a civaka Êzidî, gavên pêwîst bên avêtin. Em spasiya we dikin ji bo hesasiyet, baldarî û hewldanên we yê derbarê vê mijara giring de.

Bi rêz û hurmet  
**Tevgera Jinên Azad**